

Bîstsalaiya goçkirina birêz Nûredîn-Zaza

Hesenê Cûmi

Bi birbanga şevê ji şevên zivistana – Sibat- 1919 na re, li bajarokê Madanê, li Kurdistana Bakur, qêrîn bi N. Zaza dikeve û çavên xwe vedike. N. Zaza kurê Yûsif EFendî kurê Ibrahîm Mistefa ye. Bapîrê wî Ibrahîm, parêzgehê bajarokê Madanê bû, malake welatparêz û mala wan li ber mîvanan hertim vekirî bû.

Piştî rûxandina serhildana bavê kal Şêx Sîdê Pîranî, bav, herdu bira û pismamê wî, Osman efendî ji hêla destlata kemalîzmê ve têne girtin. Di zîndanê de, pismamê wê, ji ber helwestên xwe ve tê guştin û bav û herdu bira, piştî deh heyvan têne azadkirin. Di 28 ê Ç. Pêşîn de, diya xwe diçe ser dilovaniya xwedê, ev bûyer birîneke kûr di dilê wî de çêdike. Piştî hilewşandina şoreşa Agirî ya bi seroktiya Ihsan paşa, ew û birayê wî Dr. Nafiz, malbata Arif Ebas û Zulfî ji neçarî derbasî bin xetê dibin û li bajarê Heleb bi cî û war dibin. Di Êlûna 1930î de, ew û birayê xwe berê xwe didin Şamê û taxa Kurdan bi cî û war dibin. Di sala 1944 an de, berê xwe dide Kurdistana Başûr, lê mixabin, li gel hevalên xwe têne girtin û 12 heyvan li zîndanên Mûsil û Bexdadê dimînin. Piştî zîndanê berî xwe dide Libnanê û xwendina xwe didomîne. Piştî Lîsansa rêzanî distîne, berê xwe dide Siwêsrâ. Di heyva çilê 1949 an de, bi birêz Ismet Şerîf Wanlî re û xwendekarên Kurd li Siwêsrâ, komela xwendekarên Kurd li Ewropa dadmezrînin. Di dawiya hizêrana 1956 an de, piştî diktora kuta dike. Li Sûriyê vedigere.? Li ser vegera xwe weha dibêje:

Dema ez ji gemiyê peyabûm, min dizanî ku, gelê Kurd li Sûriyê pir hêvî û daxwazan ji min dike. Gelo: Ezê karibim wan hêviyan bi cî bînim ?!

Piştî damezrandina yekemîn Partiya demokrat a Kurd li Sûriyê, di 14ê hizêrana 1957 an de, berêz Dr. N. Zaza derbasî nav refê partî dibe û yekem serokê partî bi nav dibe. Di sala 1960 î de, destlata Sûriyê, bi hovîtî dest davêje endamên partî, piraniya endamên komîta navendî û di nav wan de, Dr. N. Zaza jî tê girtin. Li Pêş dadgehê, Dr. N. Zaza, bi hişmendî di ber mafên gelê xwe û hebûna wî ya dîrokî de bervedanê dike : **Ez ne cudaxwazim ez mafê gelê Kurd dixwazim.** Piştî salekê azad dibe. Piştî wergêra partiya Be,s ya di 8 ê avdara 1963, Dr. N. Zaza dikeve bin biveke mezin. Lewre, berê xwe dide Libnanê. L wir jî, ji ber karê xwe yê kurdayetî bi cî nabe, destlata Libnanê wî derbasî Jordinê dikin û destlata Jordinê jî, wî ji nû ve vedigerînin Libnanê ew jî, ji hêla xwe ve, di 15 sibata 1966 an de, didine destlata Sûriyê û 7 heyvan di zîdana Şêx Hesen de diborêne. Di şerê Erebb û Isra,îl yê di 5ê hizêrana 1967 de, keys dikeve Dr. N. Zaza û direve Kurdistana Bakur û di sala 1970 î de neçar dibe û penaberî Siwêsrâ û li wir bi rojnemevana Siwêsrî Gilbete Fare re dizewice û tek kurek Şengo jêre tîne. Û li zanîgeha Loznê mamostetiya zimanê Firansî, çand û dîroka kevin dike.

Bê guman, birêz N. Zaza pir hişmend û zana bû.